

Li gor rapora RMMK'ê, roja sêşem, 17.02.2009'an, girtiyek Kurd bi navê **Rehmet Sadiqî**, di girtîgeha bajarê Sine de hate daliqandin. Tê gotin ku navhatî xwendekarê zanîngeha Azadî a Sine û bi tawan kuştina hevalekî xwe hatibû girtin û malbata kesê hatîkuştî amade nebû wî efi bike.

ZIMAN BEŞEK JÎ NASNAMEYA TAKEKES Ê NETEWÛYAN E

► 21'ê Şibata 2009'an, Roja Navneteweyî a Zimanê Zikmakî bû. Bi vê hincetê Sekreterê Giştî yê UNESCO'yê peyamek da û bal kişande ser rewşa zimanên cîhanê. UNESCO ragihand ku divêt her civakê zimanê xwe yê dayîkê nas bike û bikar bîne. Ziman weke beşek ji nasnameya takekesî û neteweyan tên hesabandin û di hemû şêklên jiyana civakî, aborî, siyasî û çandî de, roleke girîng û bi bandor dilîzin.

UNESCO'yê ragihand, di nava aliyê kêm 6 hezar zimanên cîhanê de, bêtirî 200 ziman di pêvajoya sê nîfşên berê de ji nav çûne, 538 ziman di rewşeke xirab de ne û 502 ziman jî bi xurtî di xetera nemanê de ne.

Peymanname û konvansiyonên navneteweyî ên mafê mirovan mafê axivîn bi zimanê dayîkê û perwerdebûn û bikaranîn û



derbazkirin bi nîfşa din, weke mafêke sereke yê jiyana hemû neteweyekê dizanin. Îran welatek çendzimanî ye, ji bilî zimanê Farsî, hemû ziman qedexe ne. Rapora taybet li ser vê mijarê di Rûpela 10'an de bixwînin.

Nûnerên Kongreya Neteweyên Îrana Federal Bi Karbidestên Nû Ên Amerîkayê Re Civiyar

► Roja 18'ê Şibata 2009'an, şandeke Kongreya Neteweyên Îrana Federal li Waşîngtonê, bi nûnerên diplomatîk ên dewleta nû a Amerîkayê re hevdişin pêk anî.

Di vê hevdişinê de ku di Wezareta Karê Derve de birêve çû, çend pirsên cur bi cur ên weke bînpêkirina mafê mirovan li Îranê, nemaze bînpêkirina mafên mirovî ên kêmaniyên netewî û olî ketin berbas. Wan bi hûrî û



berfirehî li ser jiyana neteweyên Îranê û pirsgirêkên wan gelan yê siyasî, aborî, civakî û çandî axivîn û li ser pêwendiyên KNÎF û dewleta nû ya Amerîkayê jî tekez kirin.

Di hevdişinê de ku diplomatên berpîrsên beşên cur bi cur yê Wezareta Derve (beşa Rojhilata Navîn, beşa Îranê, beşa Demokrasi û mafê mirovan) jî beşdar bûn, nûnerên KNÎF hêvî kirin ku dewleta nû li ser rewşa xirab a mafê mirovan dijkiyarên zêdetir ji xwe nîşan bide.

Serokatiya şanda Kongreya Neteweyên Îrana Federal li stûyê Nûnerê Partiya Demokrata Kurdistanê Îranê li Amerîka û Partiya Hevpeywendiyê Demokratîk a Ehwazê bû. Berfirehiya raporê li ser malpera me bixwînin...

Hevpeyvîn Bi Cemil Turan Re...



2

Ji Şoreşê Ve Ber Bi Şevreşê (2)



4

Mêrxasî Ê Berxwedana Sê Roje Ya Şerê Ceterê...




5

Akinciyanê Kurdistanê Goriyan Teqîna...



7

Şer Ê Şaristanî



9

Rojnamevanê Kurd, Cemîl Turan, di hevpeyvîneke taybet bi Agirî re:

“ERDOXAN DÎXWAZE HEMÛ ŞAREDA RIYÊN BAJARÊN BAKÛRÊ KURDISTANÊ BÎGRE DESTÊ XWE”

Hilbijartinên 29'ê Adara 2009'an, TRT6, pirsra Kurd li Turkiyê û çend mijarên din bûn armanca hevpeyvîneke taybet a me bi nivîskar û rojnamevanê Kurd yê Bakûrê Kurdistanê, Cemîl Turan re ku nêzik 25 salan dibe li Yûnanê dijî û dixebite. Me li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê xwe gihand wî û piştî hevdiînekek kurt bi kekê Cemîl re, wî pirsên me bi dilfirehî bersiv dan...

Hevpeyvîn: Azad Kurdi

Ez dixwazim tu xwe ji xwendevanên Agirî re bîdî nasandin...

Ez xelkê Bazîde me, Çiyayê Agirî, Bazîd bajarek dîrokî ye, nêzik Kurdistana Rojhilat e, li wir sala 1955'an ji dayîk bûm. Piştê seba xwendina zanîngehê, ez çûm bajarên Stenbol û Enqereyê. Heta 1974'an ez li Kurdistanê, Bazîde mezin bûm û mam. Ez di nav malbateke welatparêz de mezin bûme, malbata min di hemû serhildanên Agirî de cî girtine. Ez ji sala 1974'an endamê Partiya Sosyalîst bûm. Sala 79'an hemû kar û xebatên siyasî qedexa bû, ji 1980'an de, dîktatoriya Kenan Evren hat. Ez girtim û di zîndanê de bûm. Min pirr îşkence kişand. Ez mecbûr mam derketim û çûm Yûnanê. Ji 1974'an heta 1996'an ez berpîrsiyarê Partiya Sosyalîst a hemû Yûnanê bûm. Ji sala 1996'an ve, ez serbixwe dixebitim. Ez karê siyasî berdewam dikim, di rojnameyan de kar dikim, malpereke min ya taybet heye û min 4 roman jî nivîsandine.

Kekê Cemîl, di meha Adara îsal de, hilbijartinên Şaredariyan li Turkiyê tîn lidarxistin, dixwazim raya te bizanibim, tu çi qas wan hilbijartinan girîng dizanî û gelo ew Şaredariyên Kurdistana Bakûr ku di destê partiyên desthilatdar de ne/bûne, dê bikevin destê Kurdan? Kurd dê çawa di hilbijartinên îsal de ser bikevin?

Cemîl T: Hilbijartin ji bo Turkiyê girîng e, çûnkî ji aliyê hikûmetê pirsgirêkên aborî heye û hemû cîhanê jî problemeke aborî heye. Hêdî hêdî jî kirîza aborî deriyê Turkiyê dikute. Ji aliyê din jî, pirsgirêkeke xurt û mezin li hundirê Turkiyê di navbera partiyên nejadperest û Kemalîst û Îslamîstan de heye.

Erdoxan navêre bi êşkere bêje ez Îslamîst im, ditirse. Hewlê dide siyasatên xwe li gora Ewropaya giştî darêje, lê heta niha nekariye norm û standardên Yekîtiya Ewropayê jî bicî bîne, bi taybet li ser mafê gelê Kurd û azadiyên demokratîk û wd... Ji ber ku Ewropa herdem pirsra Kurd datîne

pêşberî Turkiyê. Ewropî ji Turkiyê re dibêjin, ne mumkine ku hûn mafê 20-25 milyon însanên Kurd nas nekin, ziman, kultûr, dîrok û nasnameya wî gelî hûn nas nekin. Turkiyê divê li ser rêya demokrasiyê gavan bavêje. Lewra hilbijartin ji bo Turkiyê girîng in, ji ber ku Erdoxan dixwaze hemû Şaredariyên bajarên Bakûrê Kurdistanê bigre destê xwe, çend Şaredarî di destê Kurdan de ne. Vê yekê ew pirr aciz kirine, dixwazin bigirin. Mixabin Erdoxan li hemû bajarên Kurdistanê dengên herî zêde distîne, Kurd nikarin vê qasê bidest bixin. Mirov dengê hemû partiyên Kurdan serhev bike, 5 ji sedê nake, yanî di nav 25 milyon Kurdan de, ji sedê 5 zêdetir deng nade Kurdan. Eva tiştêkî pirr nexweş û zehmet e. Ji bo me û partiyên Kurdan kêmasiyek mezin e ku nikarin dengê xelkê bidest bixin û baweriya wan bi xwe binin. Pirr kême ku di nav 25 milyon Kurdan de, ev qas kême dengên Kurdan hebin.

Sedemên vê yekê çi ne?

Cemîl T: Yek, aliyê em bikin du beş, ji aliyê zordestiya hikûmetê û partiyên Turkiyê, Polîs û wd, hemû perên xwe datînin holê, nahêlin. Ya dinê jî, baweriya xelkê bi partiyên Kurdan tune, bawerî nedane. Çima? Vê gavê Kurd yê bûne çendîn parçe û bi navekê nakevin nava hilbijartinan. Nikaribin, dixwazin, pêşniyar kirin, civiyên di hilbijartinên kevn û berê de, îsal jî rojêkê civîn çêbû, qediya. Gotin sê partiyên kurd hene ku legal kar dikin, ji bo hilbijartinên îsal jî li hev civiyên, lê mixabin civîna wan bêncam ma. Di hilbijartinê îsal de, partiyên Kurd bi tebahî dernakevin. Her kes dixwaze serbixwe dakeve hilbijartinan. Ji ber vê yekê pîrraniya dengên Kurdan diçin bo Partiya Îslamîst a Erdoxan.

Hûn li ser vê baweriyê ne ku di hilbijartinên meha Adara 2009'an de jî dê pîrraniya Şaredarî û dengê Kurdan ji bo AKP û partiyên din ên Turk be?

Cemîl T: Pirr zehmet e ku Kurd îsal jî pîrraniya Şaredariyên bajarên Kurdan bibin. Bi zehmetî dibêjim, ev min aciz dike. Ez dixwazim hemû Şaredarî sedî sed bikevin destê Kurdan. Ji bo min ne girîng e kîjan partî be, bila Kurd be: DTP dibe, HAK- PAR dibe, partiyên din dibe, kurdek serbixwe be, ne girîng e, tenê bila Kurd be. Bila Şaredariyên bajarên Kurdan nekevin destê partiyên Turkan, ev daxwaziya min e.

Pêşniyarên we çi ne? Çi divê bihê kirin?

Cemîl T: Me Kurdan siyasetek di jiyana xwe da daye ber xwe, em dibêjin, em dê welatê xwe azad bikin, dema ku rihetî ye, em dirûnin, em naxwazin tebayî hev kar û siyasetê bikin. Dema hilbijartin mehek maye, tu dibêjî were em bi hev re kar bikin. Tu nikarî. Dem hindik e. Di vê dema kin û



kurt de jî her kes polîtîka li dijî hev bikar tîne. Partiyên Kurdan li batî ku partiyên Turk rexne bikin, li dijî hev kar dikin, kêmtir dijberên xwe rexne dikin. Tu nikarî siyaseta xwe li ser rexnekirina partiyeke dinê çê bikî. Ev tiştêkî nebaş e. Rexne jî dibe, lê ne wisa be ku hebûna min bi rexnekirina te be. Bila partiyên kurd bicivin û bifikirin ku ji bo berjewendiyên Kurdan divê çî bikin.

Mixabin bajarên Kurdistanê di destê Îslamîstan de ne. Ev yek kêmasî û xetereke mezin e. Ji bo hilbijartinê berê ya Parlamentoyê jî kurdan tenê 23 kursî bidest xistin, yê din ji bo AKP daketin Parlamentoyê. Heke em Kurd yek bin û yekîtiya me hebe, em dikarin ji bo hilbijartinê tê ya Parlamentoyê nêzik 250 Parlamenterên Kurd bişînin. Bi vê qasa Parlamenteran serhildan dibe. Dema Leyla Zana rabû û bi Kurdî axivî, ew ji Parlemanê avêtin û xistin zîndanê, niha heke 250 Parlamenter rabin bi Kurdî bêjin û biaxivin, kî dikare wan bixe girtîgehê. Hebek dikare bihê şikandin, lê hejmareke zaf nikare bê şikandin. Me 25 milyon Kurdan, 25 Parlamenter tu ninin.

Kekê Cemîl, TRT6 destpêka sala 2009'an dest bi weşanê kir, derheq TRT6'ê gellek niqaş çê bûn. Tu vê gava dewleta Turk çawa dinirxîni û naveroka bernameyên wê kanalê çawa dibîni?

Cemîl T: Di destpêkê de hin alî û partî li dijî TRT6'ê derektin, gotin dê siyaseta dewletê rabigehîne, bas bike, eva 2 meh derbaz bûye, li dijî Kurdan çî tiştêk negotiye. Di warên çandî, dîrokî, hunerî û kultûrî de, programên pirr xwe hene. TRT 6 gavek biçûk ji mafên neteweyî ên kurda ye, lê paşdekişaneke mezin siyasetekê bû ku dewleta Turkiyê zêdetirî 80 salan bû dimeşand. Ji aliyê din, seba ziman TRT6 pirr girîng e. Niha jî li Bakûrê Kurdistanê dema siyasatvan jî diaxivin, piştî 4 peyvan, bêjeya pêncê Turkî ye. Em dikarin wê kêmasiyê jî ortê rakin. Ziman bi dayîk

derbas dibe, dayikên belengaz, ne xwendewar in, Kurdî nizanin, Kurdiya ku dizanin ne zanistî ye. Kurdiya rojnamevanî, nivîskî û zanistî tişteke dinê ye, ya dayik û pîrika min tişteke dinê ye. Ji ber pirsê siyasî û aborî çend milyon kurd mecbûr man derkevin Stenbol, Enqere, Îzmîr û bajarên din ên Turkiyê. Di nava wan bajarên de bi mecbûr man û asîmîle bûn, zimanê xwe ji bîr kirin, ji ber qedexebûna zimanê Kurdî, xelk mecbûr ma bi zimanê serdest bixwîne. TRTR ji bo parastina ziman gavek baş dibe. Lê kes jî nikare bibêje sibê dikûmet TRT6 nake meydana propagandaya xwe.

Zêdetirî 20 salan dibe tu li Ewropayê dijî, Turkiye gellek hewlan dide ku tevî YE bibe, hûn astengiyên hember Turkiyê bona endambûna di YE de çawa destnîşan dikin?

Cemil T: Gellek pirsgirêk û astengên Turkiyê hene ku dakeve Yekîtîya Ewropayê. Qerarên Kopenhagê astengek mezin e, li gor wê, ji Turkiyê tê xwastin ku divê tu heqê gelan nas bikî, lê heta niha Turkiye dibêje neteweyek li Turkiyê heye, ew jî Turk e, Kurd, Ermenî, Yûnanî, Erebbî, Çerkes û Gurcî tune, hemû Turk in. Qebûlkirina vê yekê ji Turkiyê pîr zehmet e.

Divê Turkiye ji bo demokrasîyê gavan bavêje, di nava Turkiyê de mirovên siyasî di nava girtîgehên derkevin û mafê mirovan bi tevahî bê parastin, îşkence tune be. YE dibêje tolerans li Turkiyê sifir e, qet tolerans tune. Binêre, li Atînayê, Polîs ciwank kuşt, mehekê hemû kes derket ber derî, bi hezaran dikan û bank tîk dan û şewitandin. Çima? Gotin heqê Polîs tune ku tu kesî bikuje. Gerek ew Polîs bê girtin.

Hikûmetê nexwest Polîsê han bigre, sistî kir, millet serhildan kir. Her kesî dît ku li Atenayê çî çêbû. Ev nebaş e, lê millet zilmê qebûl nake, tişteke li dijî mafê mirovahiyê bin, nahê pejiandin.

Ji bo vê yekê asteng û pirsgirêkên mezin pêşberî Turkiyê ne. Tenê ne pirs Kurda ye, mesela Qubrisê û çend pirsgirêkên navçeyî û navneteweyî ên Turkiyê jî hene, Turkiye heta vê gavê Qubrisê qebûl nake, di halekê de ye ku Qubris di nav YE de ye. Gellek qanûnê Turkiyê hene divê bihên guhartin û li gor normên Ewropaya giştî çê bikin.

Obama karî di hilbijartinên Amerîkayê de ser keve, bi dîtina we, hilbijartina wî dê çî bandorek li ser pirs Kurda bi giştî hebe?

Cemil T: Hatina Obama ji pîr aliyên ve nû û balkêş bû. Obama

nikare her tiştî bike, her tişt li ser bingeha berjewendîyan e, vêc û berjewendîya Amerîkayê li kîderê ye, Obama mecbûr e wisa polîtîkan çê bike.

Bi raya min siyaseta "Bush", dewleta Îranê û Ehmedînejad xurt kir, çî qasî digot ez dê êrîşê bikim, Ehmedînejad xelk û hêzên xwe zêdetir amade û komî ser hev dikir. Niha ku Obama dibêje ez li Îranê lînaxim, ez dixwazim demokrasîyê çê bikim û bi Îranê re gotûbêjê bikim. Ehmedînejad pirsgirêkên hundirê Îranê derxistibû derve, ji xelkê xwe re digotin, kar tune, hûn birçî ne û wd... tenê dijmin heye, divê em li dijmin bifikirin.

Bi sedan milyon Dolar diravê Îranê didin roket û mûşek, tank, helikopter û alavên din ên şer, dibêjin ji ber ku Amerîka tê û dê êrîşê bike, dijmin tê, Şeytan tê! Lê heke ev yek nebe, ez bawer dikim demokrasî dê zûtir di Îranê de xurt û cihgir bibe.

Ji bo parçeyên din ên Kurdistanê jî mirov nikare bêje ku Obama dê tişteke zûtir çê bike û biafirîne û rewşa Kurda bigeherîne. Kurd nabe li benda Amerîka, Ewropa û dewletên din bibin ku werin û azadiyê pêşkêşî Kurda bikin, divê Kurd bi xwe berxwe bidin. Me tenê piştgiriya wan pêwîst e.

Hûn pêşeroja pirs Kurda li Bakûrê Kurdistanê çawa dibînin?

Cemil T: Li Bakûrê Kurdistanê roj bi roj Kurd pêşde diçin û xurt dibin, rojên xwêşik nêzik in. Kurd li dîrok, ziman, çand û kultûra xwe xwedî derdikeve û seha neteweyî bi xurtî pêşde diçe. Hesta Kurdperweriyê xurt dibe.

Di beşên din de jî pêşketin tîn dîtin. Rehmetî Dr. Qasimlo digot, azadî û rizgariya Kurdistanê Turkiyê jî bo Kurda pîr girîng e, ji ber ku parçeyê herî mezin e û di her warî de girîng e ku Kurd li Turkiyê bi azadî û mafê xwe yê netewî şa bibin. Çarenivîsa hemû Kurda bi hev re girêdayî ye.

Kurda hewceyî bi yekîti, hevgirtin û hevxeberiyê heye.

Kekê Cemil, spas ku te dema xwe da vê hevpeyvîna me, gotina te ya dawiyê ji bo xwendevanên Agirî, kerem bike...

Cemil T: Spasiya we dikim, ez her gav Agirî li ser Înternetê dixwînim, ji ber ku latîni ye.... Serkevtinê jî bo we û xebata Agirî dixwazim.

Mafê Mirovan

Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecîd Heqî

Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Mafê mirovan ji aliyê Neteweyên Yekgirtî (NY) wek helwêstek li dijî cinayetên nemirovane yê Nasyonal Sosyalîstên Almaniya di salên 1933 û 1945'an de bi belgeyên YN re hatin zêdekirin.

Îşkence û kuştina zêdeyî 6 milyon Cihû, Romî, Homoseksûal û rikeberên siyasî berfirehtirîn cinayetên dijî mafê bîngêhî ên mirovaniyê di serdema modern de bûn. Pêvajoyên wek "jînosayd" û "cinayet li dijî mirovaniyê" bi awayê cudanebûyî bi wê serdema dîroka cîhanê hatine girêdan.

Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan lîsta mafên herî girîng ên mirovan ji xwe digire. Deklasyona han van mafên xwarê ji xwe digire:

- mafê jiyan, azadî û tenahiya takekes (benda 3);
 - qedexekirina koletiyê (benda 4);
 - qedexekirina îşkencê (benda 5);
 - qedexekirina girtinên xweser û zalimane, desteserkirin an dîrxistinê (benda 9);
 - mafê dadgeha adilane (benda 10);
 - mafê serbestiya rêxistinê (benda 13);
 - mafê xwedîtiya darayiyê (benda 17);
 - mafê serbestiya raman, hizirkirinê, wijdan û ol (benda 18);
 - mafê serbestiya hizir û gotin (raderbîrîn) (benda 19);
 - mafê serbestiya civîn û rêxistinê (benda 20);
 - mafê beşdarî di dewleta welatê xwe de (benda 21).
- Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan her wisa hin mafên girîng ên civakî û aborî ji li xwe girtiye:
- mafê karkirin (benda 23);
 - mafê bidestxistin û bilindkirina asta jiyana mirovan, wek xwarin, cil û berg, xanî û tendurustiyê (benda 25);
 - mafê xwendin û perwerdebûnê (benda 26).
- Mafê çandî û mafê beşdarîkirin di jiyana çandî ya civaka xwe de, ji bo parvekirin di pêşkevîtinê zanistî û mafê exlaqî û maddeyî yê xwedîtiya destkevtên zanistî, edebî an hunerî yê takekesan de (benda 27).

Ew mafane di du peymanên navnetewî de hatine çîkirin ku di civîna sala 1966'an de hatine pejiandin: Carnameya Navnetewî ya Mafên Sivîl û Siyasî û Carnameya Navnetewî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî. Cudahiya wan digel Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan di vê çendê de ye ku di wan peymannameyan de mafê daxwaza penaberî, mafê şarovendî û mafê xwedîtiyê nehatiye. Carnameya Mafên Sivîl û Siyasî wê yekê bi Carnameya Cîhanî zêde dike, ku hemû ew mirovên ku mafê serbestiya wan hatiye zevtkirin, diviya bi awayekî mirovanî bi wan re liv û reftar bê kirin û hurmeta mirovaniya wan bê parastin û kesek din nabe bê cezakirin ji ber karekê ku ew kes pê hatiye mehkûm û cezakirin. Di benda 1 a herdu peymannameyan de bi awayekî vekirî mafê diyarîkirina çarenivîsa gelan bas dikin. Ew peymanname gellek ji Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan berfirehtir hatine şirovekirin û hejmarek sînor di wan de hene. Herdu di sala 1976'an de ketin rojevê. Konvansiyona mafên Sivîl û Siyasî (havîna 1993) ji aliyê 120 dewletan hatiye wajokirin. Konvansiyona mafên Aborî, Civakî û Çandî jî ji aliyê 119 welatan hatiye wajokirin.

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



Ji Şoreşê Ve Ber Bi Şevreşê (2)

Koma ku li ser navê "Cemiyetê Heyethayê Mutilifê Îslamî" Cîvata Şandên Hevberdên Îslamî kar

dikir, bi piştgiriya ayetullah Xumeynî, di demek kin de piştî tevçûna rêjîma Şah karî rengê xwe biguhere û organên desthilatê yek bi yek bigre destê xwe. Himên rêjîma nû di mehên yekê yê piştî hilweşîna rêjîma Şah de hat danîn. Melayên ku bi felsefeya Wilayetê Feqîh û bi diruşmên ku roj bi roj pitir rengê îdeolojî bi xwe ve digirtin, meydan ji reqîbên xwe re teng dikirin, ji destpêka jiyana xwe ve metoda Nazîstên Alman bi kar anîn.

Weke Adolf Hîtler, Ayetullah Xumeynî jî 13 sal ji bo pêşvebirin û amadekirina felsefeya xwe ya siyasî kar kir. Partiya Nasyonel Sosyalîst a Karkerî ya Alman (NSDAP) ku weke partiya Nazi tê naskirin, ji sala 1920 ve heya 1933'an kar kir ku bingeha felsefî û îdeoloji ya desthilata xwe bi hêz bike. Xumeynî salên navbera 1965- 1978 ji bo ve yekê bi kar anîn. Hîtler bi pirtûka "Mien Kampf", şer an têkoşîna min û Ayetullah Xumeynî bi "Wilayetê Feqîh" bingeha rêjîmên îdeolojîk danîn. NSDAP bi rîya hilbijartina legal û bi dengê gelê Almanya sala 1933'an hate ser kar. Cemiyeta Heyethên Mutilife piştî tevçûna rêjîma Şah, derbasî jiyana partîyê bû û dema ku li ser navê Hizba Komara Îslamî xebata xwe meşand, bi rîya refrandomê pêgeha xwe ya siyasî xurt kir. Komara nû di serî de sistema Îslamî û li pey re jî Yasaya Bingehîn a nû bi dengê xelkê dane rûniştandin. Her du beşên pilana desthilatdarên nû qedera Îranê ber bi tarîbûnê ve birin.

Rêjîma nû, metodên Naziyan bi tenê di warê şeweya bidestgirtina desthilatê de nehişt. Mîna rêjîma Nazi, Komara Îslamî jî di serî de ewên ne weke xwe difikirin, ji hev cuda kirin û her car yek ji wan kire armanc. Kurd bûne qurbaniyên yekê, çawa ku li Alman Cihû bûn armanca yekem ya êrîşan. Li pey re Mucahidîn, Çirîkên Fedayî, hêzên din yê çep, Partiya Tûde û li pey re jî Liberalên hevpeymanên rêjîmê, heya ku di dawiyê de desthilatdarên Komara Îslamî destê xwe avêtin qirka hevpeymanên xwe yê pîrr nêzik jî. Li Almaniya Kommunist, Sosyalist, Liberal û li dawiyê jî hevpeymanên Nazîstan, di salên navbera 1933-1939'an de ketibûn ber êrîşê. Dema rêjîma Komara Îslamî bi yekcarî çengên xwe li qirka gelên Îranê şidand û hemû alî û komên di şoreşê de beşdar, ji destkevt û desthilatê dûr xistin, êdî vegeriya ser kesên ku weke zarokên şoreşê dihatin hesabandin, lê daxwaz dikirin parek ji destketan bi dest wan jî bikeve.

Jiyana siyasî ya Komara Îslamî, bi tev li heyva navbera Rêbendana sala 1357 (1979) dest pê kir, lê bi şerê sala 1980'an re derbazî

qonaxa çarenûsaz bû. Siloganên zêdexwaz ên Xumeynî, kêrî pilana stratêjîk ya Saddam Huseyn hatin û li payîza sala 1988ê, artêşa Îraqê êrîşê Îranê kir. Ji wê demê ve heta bi dawî hatina şer li sala 1988'an, Komara Îslamî hemû hêvî û daxwaziyên gelên Îranê, bi hêceta şerê bi dijîmîne dereke re bin pê kirin. Li Kurdistanê rewşa awarte jiyana xelkê medenî hê dijwartir kiribû. Di heman demê de şerek berfireh li bin siya şerê bi Îraqê re li dijî gelê Kurd di hate meşandin. Bi dawî hatina şer li sala 1988 û mirina Xumeynî li sala 1989 re, hêzek nû di nava civakê de peyda bû ku bi regek niv eşkere daxwazên siyasî li hember rêjîmê bilind kir. Hevdem digel wê pêngava bi cesaret ku bawerî da azadixwazan, bêbaweriya bi rêjîmê re di nava komên xelkê de jî bi hêz bû. Digel wê pêvajoyê, beşek ji karbidestan jî bera xwe ji rêjîmê zivirandin û hêdî hêdî xwe ji desthilata Komara Îslamî dûr xistin. Tevgerêk nû ya guhertinxwaz serî hilda, lê tevgerê nekarî bi awayekî berbiçav li hember rêjîmê bisekine. Berxwedana nû zû reng û rêbaza xwe guherî û bi şekî tevgerêk rewşenbîrî hate meydand.

Di hember tevgera nû de, 2 karbidestên here sereke yê rêjîmê, Haşimî Refsencanî û rêberê nû Elî Xameneî mijara *avedaniyê* anîn rojevê. Siloganên dema şer çiyê xwe dan diruşmên *avedaniyê*. Lê pilana nû ya rêjîmê bi tenê kêrî kartelên xurt ên girêdayî bi sistemê hat. 7 kartêlan ku bi navê bunyadên cudareng kar dikirin, hemû aboriya Îranê girtin bin hingilê xwe. Aboriya welat ku %80 bi dahata petrol/neftê re girêdayî ye, bi diruşmên nû nehat guhertin. Berevajî, weke di hate texminkirin, %80 dewlemendiya Îranê kete destê %10 xelkê û bi tenê %20 dewlemendiya welat di destê %90 xelkê xizan û hejar de ma. Di nava qada dewlemend de, Haşimî Refsencanî, kurê Elî Xameneî, Mihemedsadiq Mehsûlî, Muhsin Refîqûdûst û gellek kesên din yê ku wê demê di desthilatê de bûn, aboriya welat kontrol dikirin. Beşa bermayî ji siyasat û pirojeyên aborî kete destê Bunyad an weqfên mezin ên aborî, ku tê texminkirin, hêj nêz %50 dewlemendiya welat di destê wan de ye. Di nava 7 Bunyadên xurt de, tê payîn ku 5 ji wan desthilata herî xurt ya aborî zevt kiribin: Bunyadê Mustazafîn û Canbazan; Astanêyê Qudsê Rezewî; Şehîd; Îmdadê Îmam Xumeynî û 15ê Xurdad. Hemû ev bunyad bi awayekî rasterast girêdayî biroya serokê olî ne û dikarin maliyat û hesabê nedin dewletê. Di warê siyasî de jî teror, komkujîya li girtîgehên, girtin û bêdengkirina dengên dijber bi tundî hate meşandin. Lewma Refsencanî û pilanên wî êdî di nava xelkê û heta di nava alîgirên rêjîmê de jî tu bawerî û hurmet nema. Dema diruşma *avedankirinê* rengê xwe jî dest da, êdî Komara Îslamî kete tîrsa hindê ku neke ji ber bê baweriya xelkê, dijberiya bi sistemê re bikeve şekî rêxistinî û bibe tefhîkeyek ji bo desthilatê.

Lewma wê carê diruşma *Serrastkirin* an Reformistîyê anîn rojevê û Xatemî bû alahilgîrê diruşma nû.

Di wê demê de êdî dijberiya bi sistemê re ketibû rojeva welêt. Partiyên siyasî, eger bi derfetên kêm û meydanek berteng be jî, lê serî hildabûn û tevgera guhertinxwaz bi hêviya ku Xatemî jî bo guhertinan rê veke, piştgiri dan wî. Digel kes û hêzên guhertinxwaz, nişana nû ya ku li pey şoreşa 1979'an re tevli jiyana siyasî bibû û li şerê bi Îraqê re keda herî mezin dabû, xwe amade didît berhema têkoşîna xwe ya nêz 20 salan di desthilatê de bibîne. Pêşengên wê grûpê jî tevli tevgera guhertinxwaz bûn, û wan hêvî dikirin ku Xatemî derfetê bide wan daku beşek ji daxwazên siyasî yê wan bîn bicîanîn.

Lê dema tevgerê hêz û qaweta xwe nişan da, rêjîmê dubare rûyê xwe yê serkutker nişan da û metodên Nazîstan ji bo tesfîyêkirina dijberên xwe bi kar anîn. Serkuta li zanîngehan û girtin û kuştina dijberan dubare kete rojevê û Xatemî jî di demek kin de reng û rûyê xwe ji dest da. Êdî hêviya ku tevgerên hundir bikaribin rêjîm an siyaseta wê biguherin nema. Maskeya Xatemî ji rûyê rêjîma Komara Îslamî ket û silogana sererastkirinê jî ji modeyê ket. Digel ku tevgera reformist hate serkutkirin, lê dîsan Komara Îslamî kete tîrsa hindê neke tevgerên nû bawerî û hêz dabîn civakê ku bi awayekî sistematîk ji bo guhertinan bikeve nava tevgerê, lewma dubare rêjîmê rûyê xwe yê hişk û alîgirê tundtîjîyê nişan da. Danepêş ya Pasdarek mîna Mehmûd Ehmedînijad mînaka herî xurt ya vê nêzîkbûnê bû. Ehmedînijad di hilbijartina serokkomariyê de dengê yekê anî. Digel ku serokkomar berî ku bikeve ber dengdana xelkê, ji aliyê rêberê olî û Konseya Parêzvan ve tê diyarkirin, lê dîsan dengên ji Ehmedînijad re hatin dan, nişan dan tu baweriya xelkê bi guhertinan bi rîya reforman re li Îranê nîne. Niha, 30 sal paş tevçûna rêjîma Şah, tê meroqkirin ka gelo xelkê Îranê çî bi dest xistin Şoreşa ku dihat hêvîkirin rê ji bo demkoraşî û *avedaniya* welat veke, bû bela serê Îranê. Ji rewşa siyasî hê kaviltir, rewşa jiyana xelkê ye. Li gor serhejmarîyên rêjîmê bi xwe, 1,2 milyon kes li Îranê madeyên hişber bi kar tînin. Hejmara serrast bi kinî sê hindî hejmarên fermî yê rêjîmê ye. Rêjeya bêkariyê tê payîn ku di demek kin de jî %24 derbas bibe. Pitir ji 15 milyon kes li Îranê li bin hêla hejariyê re dijîn. Nexweşiya AIDS her roj qurbaniyan digre. Jiyana civakî tîk çûye. Ol, bawerî, ziman, kultûr û baweriya hemû ewên li gor felsefeya Wilayetê Feqîh tev nagerin, tê serkutkirin. Jin ji jiyane hatiye bêparhiştin û gelên Îranê jî hemû mafên siyasî, civakî û kultûrî bêpar in. Di heman demê de Îran bûye xwanuxwê ji bo terorîst û tundajoyan. **Dom di rûpela 6'an de...**

Mêrxasî û berxwedana sê roje ya şerê Ceterê

Gelî Hevalan ! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!

Beşa 4



Silêman Keleşî

Her çawa di beşa sêyem de hate diyarkirin, hêzên Pêşmerge piştî du rojan şer li ser rêya bajarê Selmas, Urmiye – Tehran

û gundê Berdiyanê, karîr derbeyên mezin û giran ên aborî li dijmin bixin û her wisa kuştina û birîndar û êxsîrkirina bêtiirî dehan kes ji hêzên şerker ên dijmin lê ket. Di wan du rojên şer de dehan çekên cur be cur û alavên eskerî ketne destê parêzvanên Kurdistanê.

Belê hêzên me piştî wan hemû berxwedan û mêrxasiyên ku di wan du rojên derbazbûyî de li wê herêma ser bi bajarê Selmasê kiribûn, dixwastin wek usûl û azîneke şerê partîzanî ji cihên şer dûr bikevin, heta şerekî dinê ser wan de nehê sepandin, ji ber vê hindê Pêşmergan dixwast heta îmkân hebe ew meydan û wextê şer diyarî bikin, lê dijmin jî hewla xwe dida ku wî şerî bi Pêşmergan re bisepine, tehmîl bike, dijmin ewa bi derfet û firsendeke mezin dizanî ku du roj û şev e hêzên Pêşmerge şer dikin, niha şehîd û birîndar zaf hene, dibe fişekên wan kêman mabin, (ew qisane yê wan kesan bûn ku di gundê Berdiyanê de bi destê parêzvanên Kurdistanê hatibûne êxsîrkirin, bo hevalan digotin) her ji ber vê yekê bû ku dijmin hemû ciyan amadebûn ragihandibû ku divê hemû rêyan li wan Kadro û Pêşmergan PDKÎ bigrin û nehêlin xilas bin û wek ravçiyân wan rav bike, çî bi kuştî be yan jî bi êxsîrî.

Dijmin bona gihîştin bi wê armancê ew hemû hêz û qaweta xwe kom kiribû û bi kuştin dida ku wê hêza Pêşmerge tune bike û jî nav bibe, lê xewn û xeyalên wan gellek pûç û dûr ji heqîqetê bûn, ku bikarin wê yekê bi serê Pêşmergên Kurdistanê binin. *(her di dema wê nivîsînê de, mêrxasiyeke dîrokî ya berxwedana çend Kurdên wê herêmê hate bîra min, heft e ku ez ji bo we xwendevanên hêja nenivîsim, renga bê hencet jî nebe, ew jî ewa ye: Di Sala 1905'an de, dema ku Muzeferdîn Şahê Qacar, Şahê Îranê bû, birayê Simkoyê Şikak yê mezin, Cewer Axa bi qewlê Quranê ser hindêk meselên girêdayî bi Kura û Kurdistanê ve wek mêvan vexwande bo bajarê Tewrêzê û bi îxanetê û fêlan mêvanên dîlsaf ên xwe şehîd kirin, lê heft kes çekdar digel Cewer Axa bûne, du kes ji wan digel wî şehîd dibin, û ew pênc kesên din ku dimînin, pîr çelengane û mêrxasane di nava koşk û serayên wan bi nebeledî li dijî wan hemû hêzên Îranê şer dikin û gellek hêzên wan dikuji û bi saxî û silametî xwe digijîne herêmên Bakûrê Kurdistana Îranê). Îca eger wan ew destana zanîbana, ku nekarîn pêşiya 5 mêrxasan di nava koşk û serayên xwe de bigrin û wan bikujin, dê çawa bikarin pêşiya wan hemû mêrxasên Kurda li himbêza gel*

û di nav dilê çiya û deşt û newalên Kurdistanê de bigrin yan jî bikujin. Renge gellek caran dijmin karîbe bi fend, fêl û pîlanên bê exlaqê derbane li rêberên Kurd û Kurdan bixin, lê çî wextan nekariye rasterast li hember mêrxasî û berxwedan û cangorîtiya Kurdan de serketinê bi destve bîne.

Hêza me bo bêhnvedan û xwe dûrkerin li şer, deşt û dolên herêma Somayê dibirrin, ji bo ku şeva 15 li ser 16.10.1363 (1984) xwe bigijînin gundê Ceterê.

Divê bête gotin ku gundê Ceterê dikeve ser sinorê navçeya Enzelê û Somayê, û digel wan gundên her du devera jî cîran e, gundê Mîrava, Mîngol, Êngîce li herêma Somayê û gundên Mehmûdan, Hacîbayrem û Qehremanê ji navça Enzelê.

Gundê Ceterê ji aliyê başûr pala xwe dide hûre milikên ku her du herêmên navhatî ji hev vediqetîne, lê her sê aliyên din ên gund deşt û rastayî ye, tenê hindêk hûre dolikên piçûk û golmekên bin gund hene.

Dema ku hêzên me gihîştin gund, bi lez di nava malan de parve bûn û piştî danîna çend nobedaram bona parastinê di nava gund de, her wisa şandina çend hevalên lika me bo kontrolkirina serê wan hûre milikên ku zal bûn bi ser gundan hatne şandin, ku navê wan çend kesan wiha ye: Dêwane Ebdullahî, ku niha li welatê Fîlandê dimîne, L. H, Heyder Aqazade û Mewlûd Ebdullahî, hewce ye bê gotin hevalê Mewlûd her di wî şerî de Şehîd bû û Heyder Aqazade jî şeva piştî girtina binkeya leşkerî ya gundê Zengekan di herêma Kinarberoj di boseyeke dijmin de li nêzik gundê Golegeniyê di havîna sala 1365'an de hate Şehîdkirin).

Piştî şandina wê timê û danîna nobedaran li dewra gund, heval ketin bêhnvedanê, ez dizanim ku piştî çend demjimêran bêhnvedanê, derê mala ku em tede bûn, kutan û gotin: rabin! êrîşeke mezin ji bo gund tê! Dema ku em li malê derketin, mirov dikarî karwanê dûr û dirêj

yê otomîlên leşkerê dijmin li ser cada Somayê bo Selman û Urmiyê bibîne, derdora demjimêr 9.30 heta 10'ê sibê bû ku dijmin bera leşkerê xwe ku bi hemû çek û silahên qurs û alavên şer da gundê Ceterê ku Pêşmergên PDKÎ lê bûn.

Belê dema em xatircem bûn ku hêzên dijmin hêdî hêdî ber li aliyê gund tîn, fermanderên eskerî ketin rêxistina hevalan û ji bo hêzên Pêşmerge cî diyarî kirin, fermanderê hêza me Mela Xalid Baqî û cîgirê wî Haşim Îbrahîmî ferman dane lika me ku hewce ye her çî zûtir hêzeke zafîr bo ser wan cihên bilind bihê şandin, ji ber ku çend hevalên me her li şevê lê bûn, heta wan ciyên stratêjîk xurt û bi hêz bikin, ew ser milik bo me heyatî bûn. Em wisa difikirin ku renga hêzên dijmin ji aliyê herêma Enzelê ve jî êrîş bikin ser Pêşmergan û yek carî bêxin di nava dorpêça xwe de, lewra me çend kes destnişan kirin ku berî destpêkirina şer, xwe bigihîjin bal wan hevalên ser mil. Navê wan hevalan jî ev bûn: Behram Azadfer, Mecîd Nûrî, Mihemedsalih Şahînzade, hevalên dinê jî A. P, û Toñîq Bawanî bû ku di nîva rê de şehîd bû, û xêncî Behram Azadfer ew hevalên dinê nekarîn ber top û mûşekbarana dijmin herin û vergeriyan nav gund, lê şehîd Behran di bin wî agirê tund yê dijmin de, karî bi birîndariyeke sivik xwe bigehîne hevalan. Renga hevalên din jî hebin, lê bîra min nemabin. *(Behram Azadfer, kesekî Azerîziman bû, gellek zehmet û fidakarî di nava refên PDKÎ de kişandiye, ew Kadr û Fermaderekî pîr zana û lêhatî bû, gellek Pêşmergên nexwandewar di wê zirûfa dijwar ya xebata çekdarî de ji Behram fêrî xwendin û nivîsînê bûn, dema ku Behram dixwest wek penaber derkeve dereveyî welêt, di Ankara paytexta Turkiyê de, bi destê terorîstên Komara Îslamî hate şehîdkirin).*

Divêt bê gotin, dema ku berpîrsên siyasî û eskerî ji bo şerekî qurs û giran, ketin liv û



tevger û rêxistina hevalên Kadr û Pêşmerge di nava gund û derdora wê, her di wê demê de ku Kadr û Pêşmerge ketin liv û tevgerên xwe amadekirinê, û ew hevalên ku dixwastin ber bi wan ciyên zal bi ser gund de biçin û li gund derkevin, dijmin bi hemû hêz û qaweta xwe ew heval û derdorên gund bi top û qumpare, katyûşa û çekên dûrhavêj da ber êrîşê, ku ew desta Pêşmerge negihîjin ser wan girikan. Ew yekemîn liv û hereketa dijimin bû ku nehêla kes li gund derkeve û şer pan û berfirehtir bikin.

Her wekî li jor jî hate gotin, dijmin bi derketina wê desta Pêşmergan dest bi top û katyûşabaraneke gellek tund kir, ku nehêla ew çend hevalên me bigehin wî ciyê ku ji wan re hatibû diyarîkirin.

Hêzên dijimin ji aliyekê topbaran dikir û ji aliyekî din ve jî hêzên peyarew ên xwe li gund ji bo dorpêckirina Pêşmergan nêzik dikir, dijmin di şerê wan du rojên derbazbûyî de gellek derbên mezin û qurs ji destê Pêşmergan di wan herêmên hasas û bi qewilê wan hatîpaksazîkirî ji hêzên PDKÎ xwaribûn, ji ber wê yekê, hêzên Komara Îslamî di nava xelkê û bal fermanderên xwe serşor û şermezar bibûn, ku ew hemû derbe ji destê Pêşmerga xwarine, heta niha jî nekarîne derbeyan li Pêşmergan bixin, bi hemû awayekê hewil didan ku wê yekê cibran bikin. Ewa bû ku li hemû îmkatên xwe yên şer bona wê armancê mifah wergirtin ku anîbûn qada şer. Divê bê xuyakirin, dijmin roja pêştir di gundê Berdiyanê de gellek hewl da ku bikare tolê hilde, lê bi xweşî ve ew yek ji bo wan çê nebû.

Lewra dijmin îro hêzên xwe li bajêrên Urmiye, Selmas, Kela Xoyê û ... bi hemû çek û cebilxaneyên mişe û qurs ên xwe ji bo gundê Ceterê anî bûn, heta bikarin îro hemû parêzvanên Kurdistanê ku ewa sê roj û sê şev e bêwestan şer dikin yan bigirin yan bikujin û ji nav bibin. Dijminan gellek caran bi wan xewn û xeyalan pîlan danîne û êrîş kirine ser şervanên azadîxwaz ên Kurdistanê di nava refên PDKÎ de, lê herdem serê wan li ber û kevirên hişk ên çiyayên

serbilind yê Kurdistanê ketiye. Divê ewa baş fêhm kiriban, ku mîrxasên demokrat di roja qewimandinê de birsîti û tînîbûn, sir û seqem, dorpêckirin û çek û cebilxaneya zaf, li hember bîr û bawer xwe de tiştêkî pîr mezin nabînin, lewra her wextê ku Pêşmergan xwastibin bi hêz û îmkatên kêrîne ser hêzên zaf û çek û silâhên bê rade yê dijmin de serkevin û çendî berabêrê xwe li wan bikujin û çek û silâhan bi dest bixin.

Gundê Ceterê di bin topbarana tund û bê rehmane ya dagirkerên dilreq de dihatê dorpêckirin, hêzên dijmin jî xwe li gund û çeperên Pêşmergên azadîxwaz nêzik kirin û topxana dijmin nava gund jî bi top û katyûşayabaran dikir, niha dîsa bêhna barût û xwînê hemû ciyê Ceterê girtiye, esmanê gund li ber dükela top û katyûşabarana dijmin wek evrekî reş girtibû, derdorên gund hemû li bera zaf stûr hatibû girtin, lê piştî demekê jî ber agirê topxana dijmin reş û belek bû.

Di nava gund de, dengê girî, qîjeqîj û lorîna zarok û hawara dayik û bavên zarokên sivîl û bêguneh dihat ku gazî Xwedayê xwe dikirin û digotin: **"Xwedê çi ji destê me nayê, tu bi xwe rehm û dilovaniyekê bi me bike û van kafira ku zarokê me dikujn, nabûd bike"**. Ji aliyê din, dengê ofên û nalîna birîndaran dihat ku li ser berfê ketibûn û xwîna wan ya sor digel sipiyahiya berfê tikel bibû, ku mirov baş li wan neqş û nîgarê ku bi xwîna wan şehîd û birîndaran ser berfê hatibû xemilandin û mirov dizanî ku çawa û bo kîderê çûye yan jî hatiye birin.

Ji ber topbarana xurt a dijmin, çendî şehîd û birîndarên me di nava gund de çêbûne, ji ber wê topbaranê dikarim bêjim ew rêxistin û arayêşa eskerî ku ji aliyên fermanderên eskerî ve hatibû kirin, têk çobû û mirov dikarî ne rêkûpêkiyê bibîne, ji ber vê çendê carê hêzên dijmin hinde nehatibûne nêzik ku Pêşmerge bi çekên sivik bi wan re şer bikin, tenê dijmin ji dûr ve bi çekên qurs gund û çeperên Pêşmergan bidin ber êrîşê û dişewitandin.

Dûmahîk heye ...

Doma rûpela 3

Îro Komara Îslamî, hem ji bo gelên Îranê û hem ji cîhana hevdem re astengî û belaya herî mezin e. Lewma ji bo ewlekarî û asayîşê gelên Îranê û civaka cîhanî guhertina sîstema Komara Îslamî mercê herî bîngêhî ye. Lê guhertina rêjîmê bi îmkana opozîsiyonekî ji hev belav û dûr ji xelkê ne mumkîne. Hevberdîyê siyasî li derveyî Îranê bi rîya pêwendiyên xurt bi tevgerên hundirî welat re dikare zemînê ji bo guhertina rêjîmê xweş bike. Ji bo hevpeymanîyê bi vî şekîlî, berî her tiştî pêwîst e rêbaz û metodên ku rêjîm bi wan dijî, bîn guhertin. Bi awayekê ku daxwaza avakirin û jiyandinê bikeve ciyê daxwaz û rêbaza ji nav birin û tunekirinê.

Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar:
Omid Esxeran
omid_anbi@yahoo.com



Cîhana Sêyem

Têgiha han di dehsalên 1950 û 1960'an ên Zayînî de berfireh bû û hejmarek ji welatan li Asiya û Afrîqayê bixwe ve digire ku taze gihîştibûn serxwebûnê. Her wiha wan

welatan jî bixwe ve digire ku di rêza welatên pêşketî ên sermayedarî de yan jî yên Komonîstî ne. Ên weke Çîn, Kureya Bakur, Vîyetnam (her çend ku welatên han di rêza welatên Komonîst de ne, lê weke cîhana sêyem tîne hesabandin).

Peyvên parvemayî, kêr parvemayî û di halê pêşveçûnê de, ji bo welatên han tîk bikaranîn. Cîhana sêyem piraniya welatên Amerîkaya Latîn, Asiya û Afrîqayê bixwe ve digire. Piraniya welatên han derbazbûyîyê bindestî û koloniyalîzmê hene ku dijberiyê tevî welatên dagirker dikin û rastî pirsgirêka xizani, destkurtî û zêdebûna asta rûniştvanan bûne. Hêjayî gotinê ye ku welatên han zêdetirî 2 ji 3 a endamên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî pêk tînin.

Di dehsalên 1950 û 1960'an de, bizaveke siyasî û navneteweyî bi armanca bidestveanîna nasnameyek taybet a siyasî û exlaqî li hember eniya Rojhilat û Rojava, di welatên han de dest pê kir ku rêberên bi nav û deng ên wan pêk hatibûn ji: **Cewahir Leel Nehro** li Hindistanê, **Cemal Ebdulnasir** li Misrê, **Sokarno** li Endonzyayê û **Marşal Tito** li Yugoslaviyaya berê.

Konferansên Bandog û Belgradê jî ji bo gihîştin bi armanca han pêk hatin û heta hin kesan hêvî û çavniheriya vê çendê dikirin ku eniya sêyem yan jî hêza sêyem li hember her du eniyên Rojhilat û Rojavayê de serî hil bide. Lê lawazî û qelsiya bîngêhên aborî û kirîza siyasî a hundirîn ya welatên han, rê neda ku armanca han pêk were ku di encam de her yek ber bi aliyê hêzeke mezin ve hate kişandin. Her çend ku hejmarek ji welatên bêalî her li ser siyaseta bêalîbûna xwe berdewam bûn, lê di warê îdeolojî, siyasî û aborî de pêwendiya wan tevî her yek ji wan du eniyên her mabû û piştî hîloşîna Yekîtiya Soviyetî û hatine rojeva sîstema nû a cîhanî û sîstema take enî, eniyên han jî rastî jinavçûnê hatin. Di van demên dawiyê de jî, hin nivîskarên Rojavayî parvekirinek nû anîne rojevê û welatên di halê pêşveçûnê de ku xwediyê heyînek xwezayî a zaf in, wek cîhana çarem binav dikin. Bo mînak em dikarin îşarê bi welatên xwedî petrol ên Rojhilata Navîn bikin. Çîniyan bi pesendkirina teoriya sé cîhanî, naverok, wate û reng û rûçikek nû dane peyva han. Li gor nêrîna wan cîhana sêyem her ew cîhana şoreşvan û dijî împeryalîst e ku li hember her du eniyên Împeryalîzm û Sosyal Împeryalîzmê de radiweste. Lê Komonîstan tenê bawerî bi du eniyên Împeryalîzm û Sermayedarî û Sosyalîzm û dijî Împeryalîstî hene.

**Çavkanî: (Fehengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî
(Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary"
Daryûş Aşorî**

Akinciyeñ Parêzgeha Azerbaycana Rojava Hêj Dibin Goriyê Teqîna Mayînan

Rapor: Agirî

Mayîn dujminek nivistî û veşartî ne ku tu demekê aştî û tenahiye bi xwe re bi diyarî

naîn. Ev neyarên veşartî di deverên sersînor ên Kurdistana Îranê de hêj goriyên distînin.

Li gor rapora nûçegihanê FARS'ê, teqîna mayînan û dafikên taqînê yên bi cih mayî ji serdemê şerê Îran û Îraqê, yek ji wan bûyeran tên hesêb ku serbarê derbazbûna 20 salan bi ser wî şerî, hêj niştecihên deverên sersînor tevî xeterên wan berbirû ne.

Di parêzgeha Azerbaycana Rojava de salane dehan kes seba teqîna mayînan di deverên ser tixûb canê xwe ji dest didin yan birîndar dibin.

Ew herêmên sersînor ên ku di heyamê şerê Îran û Îraqê de û herwiha şerê rejîma Îslamî tevî bizava azadîxwazane a Kurdistanê hatine mayînrêjirin, hêj nehatine paqijkirin.

Pêka rapora nûçegihaniya FARS'ê, li bajarê Urmîyê, serhejmariyên ne fermî vê rastiye derdixwe holê ku di parêzgeha Azerbaycana Rojava de bi qasî 910 hezar hektar erd hatiye mayînrêjirin. Kûrahiya ew deverên ku hêj di vê parêzgeha kurdistanê de ji mayînan nehatine paqijkirin, 10 kîlome e ku herêmên Serdeşt, Pîranşar û Selmasê bi xwe ve digire.

Nûnerê bajarên Serdeşt û Pîranşarê di Parlemana Komara Îslamê a Îranê de derheq hewlên rejîma Îranê bona paqijkirin ew deverên ku hatine mayînrêjirin got: "Hatiye ragihandin



ku di bajarên Pîranşar û Serdeştê de beşek berçav ji zeviyan ji mayînan hatine paqijkirin, lê hêj di ser sînoran de mayînan hene. Em nikarin bibêjin ku niha zeviyan paqijkirî jî sedî sed bê xeter in, çimku seba xwarin û kirrandina erdê û sedemên xwezeyî û herwiha barîna berf û baranê, mayînan di cihê xwe de nemane û cihê wan guheriye."

Wî herwiha got: Niha di bajarên Pîranşar û Serdeştê de bi qasî 15 heya 20 binkeyên leşkerî hene ku cihwarê wan ji mayînan nehatine paqijkirin.

Xincî vê yekê jî hêzên Leşkerî û Sipaha Pasdaran a rejîma Komara Îslamî jî di çarçoveya projeya daxistina sînoran de dest bi çandina mayînan di deverên sersînor ên Parêzgeha Azerbaycana Rojava de kirine.

Gelaleya han li jêr navê pêşgirtin ji qaçaxa alav û tiştan tê birêvebirin. Lê di rastî de ev gelale bona kontrolkirina gişt hatin û çûnên hêz û aliyên dijberên rejîm û kasibkarên ser sênorê û xelkê sivil tê meşandin.

Diyare hêj serhejmariyek hûr û bawerpêkirî ji hejmara kuştî û birîndarên bûyerên teqîna mayînan di herêmên ser sînor ên Azerbaycana Rojava de tune, lê cîgirê operasyonê hêzên Întîzamî ên Azerbaycana Rojava di vê derbarê de tevî nûçegihanê FARS'ê, ragihand: Di 10 mehên borî de 23 heb mayînan û alavên teqînê di gundên ser tixûbê Başûrê Kurdistanê teqîne ku bûye sebebê kuştin 7 kes û birîndarbûna 28 kesên din.

Di sala derbazbûyî de anku di sala 2008'an de jî 36 heb mayînan teqîne ku

bû sebebê birîndarbûna 50 kes û kuştina 5 kesan.

Ji aliyekî din ve seba dûrbûna navenda tendurustî û bijîşkî ji deverên ser sînor hinek caran kesên birîndarbûyî seba nebûna çavdêriya destpêkî a bijîşkî û dûrbûn ji navendên han jiyana xwe ji dest didin.

Herwiha pirogramên hînkirinê bona jordebirina asta têgîstina xelkê û agahdarkirin wan ji xeterên mayînan di astek nizim de ye.

Her di vê derheqê de zaf caran zarok seba bê haybûn ji xeterên mayînan dibin gorî û canê xwe ji dest didin.

Li gor gotina serpereştê "Bêhîstiya" bajarê Pîranşarê, di heyamê 9 mehên derbazbûyî de, li Pîranşarê 29 kes seba teqîna mayînan hatine kuştin yan birîndar bûne ku di nava wan de 16 kes zarok û nûciwan û 13 kesên din jî temen jor bûne. Di nava wan 29 kesan de, 4 kesan jiyana xwe ji dest dane û 12 kes jî kêmendam û siqet bûne.

Di her çar Parêzgehên Kurdistana Îranê de (Îlam, Kirmaşan, Kurdistan, Azerbaycana Rojava) û herwiha Parêzgeha Xûzistanê de, 16 milyon heb mayînan û alavên bi cih mayî ji şerê Îran û Îraqê û şerê rejîma Îranê tevî xelkê Kurdistanê hene.

Komara Îslamî a Îranê ne tenê amade nebûye ku peymannameya navnetewî a xebat li dijî mayînan û qedexekirina bikaranîna mayînan îmtiza bike, belku bi hêcêtin cur bi cur hêj di herêmên sersînor ên Kurdistana Îranê de mayînan diçîne.

Ednan Hesenpûr, Girtiyê Siyasî Yê Herî Bêparkirî Li Parêzgeha Kurdistanê

Rapor: Agirî- Beşa civakî

Ednan Hesenpûr, rojnamevanê girtî yê Kurd ku ji aliyê Dadgeha Şoreşa Îslamî ya bajarê

Merîwanê ve biryara îdamê bi ser de hate sepandin, girtiyê Kurd yê herî bêpar li parêzgeha Kurdistanê ye. Li gora ew nûçeyên ku ji girtîgeha navendî a bajarê Sine û xizm û kesên nêzik ên wî çalak û rojnamevanê girtî ketine dest, Ednan di du salên derbazbûyî de nemaze piştî derçûna biryara daliqandinê, bi tometa dijberîkirin bi Xwedê re, heta niha rûbirûyê zext û givaş û astengên berfireh bûye. Li gora van nûçeyane, Hesenpûr tu demekê di girtîgehê de mafê bikaranîna telefonê bi armanca têkilî tevî malbata xwe nebûye ku eva jî bînpêkirina eşkere a mafê zîndaniyan e.

Her wiha berevajî hemû girtiyên din, hevdîtînen Ednan bi malbata wî re bi awayê kabînî ye û her carê bona van cure hevdîtînane jî komek asteng û pirsgirêk ji bo malbata Hesenpûr tên çêkirin.

Kesên nêzik ên vî rojnamevanê girtî ragihandine ku bi sedema destpêranegihîştina Ednan bo telefonê, dayîka nexweş û kal a wî, hemû carê bi merema agahdarbûn li rewşa kurê xwe, neçar e rêya Merîwan- Sine bibirre ku eva jî yê bûye sedema zexta ruhî û cendekî bo ser Ednan û malbata wî. Berê jî kanalên ragihandinê belav kiribûn ku zext û givaş bo ser Ednan Hesenpûr û bêparkirina wî ji mafên herî destpêkî ên her girtiyekê weke tîkiliya telefoni berdewam e.



Ednan sala borî, bona nîşandana nerazîbûnê li hember cezayê îdamê û riftara û serederîkirina xirab û neteba tevî qanûna dadweriyê bêtirî 50 rojan gireva birçîbûnê lidar xist.

Her wiha heyamekê berî niha komek ji girtiyên siyasî û Ednan Hesenpûr jî weke yek ji wan, di nameyekê de ji bo Şahrûdî, Serokê Dezgeha Dadweriyê li Îranê ku di ragihandinan de jî hate belavkirin, serbarê destnîşankirina rewşa navendên dadweriyê û girtiyên siyasî, bi xurtî liv û riftara bi wan re û bînpêkirina mafên wan di qonaxên lêpîrsîn, dadgehî û ragirtina demkî de rexne kiribû û daxwaza pêdeçûna micid û bilez di vê derbarê de kiribûn.

Hesenpûr ku zêdetirî 2 salan e hatiye girtin, havîna sala borî ji aliyê Taya 17 a Dadgeha Şoreşa Îslamî li bajarê Merîwanê bi tawana dijberîkirin tevî Xwedê, cezayê daliqandinê bi ser de hate sepandin û ev biryare jî piştê ji aliyê Dadgeha Bilind a Komara Îslamî ve hate

erêkirin û pejirandin.

Parêzerên Ednan ev biryare bi ne şerî û berevajî qanûna cezakirinê li Îslamî û di dezgehên Dadweriya Îranê de pênase kirin û ji bo vê meremê jî nerazîbûna xwe dan xuyakirin.

Mihemedsalih Nîkbext yek ji parêzerên Hesenpûr, payîza îsal di hevpeyvînekê de tevî Ajansan, nûçeya hiloşandina cezayê îdamkirina Ednan Hesenpûr ragihand.

Piştî belavbûna nûçeya betalbûna vê biryarê, Ednan du carên din di 16'ê Xermananê û 11'ê Rêbendana îsal de hatiye dadgehîkirin ku heya niha encam û biryara dadgehê ne rohn e.

Sepandina cezayê îdamkirinê bi ser vî rojnamevanê Kurd, hevdem bû tevî derçûna cezayê daliqandina Hîwa Botîmar, çalakê sivîl yê Kurd, nigeraniyek zaf derxist holê û hejmareke zaf rêxistin û kesayetiyan cihanî û herêmî ev biryar mehkûm kirin û daxwaza serbestberdana bê şert û merc a wan kirin. Hêjayî gotinê ye ku ev rojnamevanê Kurd ku endamê Desteya Nivîskarên duheftînameya ragirtî ya ASO li parêzgeha Kurdistanê bû, tevî hejmarek ji kovar û belavokên Kurdî û Farsî li Kurdistanê û Îranê hevkarî dikir û yek ji çalakên çandî yên wê parêzgehê bû.

Her wiha di heyamê du salên derbazbûyî de, sê xelatên cihanî, weke Xelata Azadiya Çapemeniya 2007 a Îtaliyayê a taybet bi nûçegihanên biyanî, Xelata Nûçegihanên Bêsînor, Taya Swêd û Xelata Rêxistina Pena Herêmî a Bask li Îspanya a sala 2008'an, bi Ednan Hesenpûr bêtir amadebûna wî pê re hate dayîn.

Kargeheke Hînkariyê Derheq Tundûtûjî Li Dijî Jinan Li Bajarê Sine Birêve Çû

Li gor nûçeya malpera "Guhartin ji bo Wekhevîyê", roja 14.02.2009'an, bi armanca nasîna tundûtûjî û curên wê, guhartina bîr û hizran û rêçareyên berbirûbûn tevî tundûtûjîyê, kargeheke hînkariyê li bajarê Sine birêve çû.

Kargeha han bi hevkarîya du endamên Kampanya Yek Milyon Îmzayan a bajarên Tehran û Sine, bi beşdariya 32 kesên din û bo heyamê 5 demjimêran birêve çû.

Di kargeha han de, komek jinên çalak ên Sine, yên ku tevî tundûtûjîyê berbirû bibûn û jinên ku daxwazkerê perwerde û alîkariya jinan bûn, her wiha Pervîn Zebîhî û Feraset Nasirî ji Merîwanê, Sureya Pûrpeşengî li Seqizê û Gulale Behramî li Kirmaşanê, beşdar



bûn.

Di beşeke din ya wê kargeha hînkirinê de, pênaseya tundûtûjîyê û curên wê, tundûtûjîya malbatî, sedemên xweragiriya jinan, ducarebûna tundûtûjîyê, tundûtûjîya cendekî ku yek ji curên herî zaf ên tundûtûjîyê

ne, tundûtûjîya aborî û hundirî û di encam de, rêçareyên berbirûbûn tevî tundûtûjîya malbatî, ketin berbas.


Her wiha fenomenên 3 telaqe, şîrbiha, jin bi jinî (berdêlî), sinetkirina jinan û her wiha tundûtûjîyên ku di Kurdistanê de gellek zaf in, weke kuştînen namûsî û xweşewitandina jinan, ketin berbas. Di beşa dawiyê de, tundûtûjîyên yasayî û rêçareyên berbirûbûn tevî wan, ketin berbas.

Ji ber ku beşeke zaf ji tundûtûjîyên malbatî li ser bîngeha tundûtûjîya qanûnî ên ne wekhev in.

Kargeha han azmûneke nû û bimifah bû ji bo jinan û bi taybetî jinên Sine ku beşdarên çalak ên wê çalakiya hînbûnê bûn.

ŞER Û ŞARISTANÎ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynt.com



Bi guherîna rewşa pergala cîhanê ya nû re ramyariya gerdûnê dikeve kirasekî din û rewşa cîhanê dirûvekî nû digire.

Dixuye ku ji îro bi şûn de, dê ji dêvla şer û pevçûnên aborî, bîrdozî û ramyarî, têkoşînên çandî û zanyarî rû bidin û welatên dinê bidin bin bandora xwe. Her çend ku ev yek wekî bayekî hênîk bête dîtin û pêşî li xweşiya mirovan biçe jî berê vê çûyîne ne li xêrê ye.

Çimkî ev yek jî bi destê desthilatdariya dinê pêk tê û mirovahî bê hemdê xwe arasteyî tengaviyên nû dibe. Jixwe ne pêkan e ku neyar û neqencên dinê rabin ji bo mirovatiyê tişteki xêrdar û sûdewar bikin.

Îro, desthilatdariya dinê ji ber alavên şer ên kujende û teknolojîk – ên ku qira wan jî tîne- dixwazin heta demekê, şerê germ bidin rawestandî. Ne ji bo xatirê mirovahiyê, wekî her car ji bo sûd û berjewendiyên xwe, ji dêvla şerê germ, şerê sar ango çanda impyralîst didin destpêkirin. Îcar divê baş bê zanî ku şerê sar her gav jî şerê germ tirsnahtir, xeternaktir û diwartir e. Çimkî cîhana gelan û welatê dinê her car di dema şerê sar de tê/hatiye dabêşkirin, parçekirin û parvekirin. Dîrok şanî me dide ku şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn piştî şerê sar dest pê kiriye û peyre jî cîhan ji aliyê çend hêzên serdest û mêtînger ve hatiye parvekirin û talankirin. Îro mebest û armanca serdest û mêtîngerên dinê, parçekirin û parvekirina gelan û welatê wan e. Her çend ku reng, dirûv, nav û nîjada impyralîstan bête guhartin jî kar û kirinên wan tucar nayên guhartin.

Sedest û zoranên dinê, baş dizanin ku îro bi alavên şer û lêdanên bêteşe tu kes nikare bigihîje armanca xwe. Ji bo wê ye ku ew jî bi pey konevaniyên nû ketine. Tiryak û nexweşiyên nû dadihênin.

Û dîsa wekî her car êş û nexweşiyên nû yên bê êş û jan raselitî ser serê mirovahiyê dikin û tevê mêjiyê mirovatiyê bi van tiryak û nexweşiyên bezmdar pûç dikin û ditevizînin. Yanî desthilatdariya dinê îro hewceyê bi şerê germ nabîne.

Çimkî baş dizane ku komkomîkirina mirovan a bi çand û şaristaniyên nû, her gav ji ramyariyên aborî, leşkerî û bîrdozî asantir û watedartir e. Gava ku behsa şaristaniyê tê kirin, pêşî çand û dîroka kevna û şaristaniya gelan tê bîra mirov. Şaristanî, hebûneke çandî û mirovî ye.

Gund û bajar, nîjad û ol, civak û neteweyên dîrokî hemû pûxtiyên şaristaniyê ne. Veguhêztina şaristaniyên kevna, girêdayî rabirdûya çanda mirovahiyê dirûvên nû digire. Îro her

berhemeke dîrokî, nîjad û civakeke kevna bi bîra mirov dixe.

Bêguman ev yek di dahatûya mirovahiyê de jî roleke pîr girîng û dîyarker dileyîze. Hebûna civak û nîjadên dîrokî, girêdayî şaristaniyên kevna e. Şaristaniya hemdem a îroyîn li ser rîknê çanda şaristaniyên kevna û qedîm ava bûye. Alavên têknolojiyê û geşepêdaniya zanyariyên civakî, hem pevkelijandina çanda kevna û nûjen û hem jî şaristaniya hevpar û hemdem a îroyîn pêk aniye. Bi kurtayî şaristaniya îroyîn, bi pevkelijandina şeş-heft şaristaniyên cîhanê yên kevna û nûjen re li nasnaveke nû dadigere. Ev şaristaniyên kevna û nûjen hin jê ev in: Şaristaniya Rojava, Şaristaniya Japonî, Şaristaniya Hindê, Şaristaniya Îslamê, Şaristaniya Slava, Şaristaniya Amerîkaya Latîn, Şaristaniya Misrê, Şaristaniya Mezopotmayayê û Şaristaniya Afrîqayê.

Dibe ku di pêşerojê de jî têkoşîna navbera van şaristaniyan bidome. Belê heke bi vî awayî bidome, dê cîhana hemdem û mirovahiya navser bi lêkdana navbera van şaristaniyan re li şaristaniyêke nû ya hevpar bihesile. Ango wê şaristaniyên kevna jî nikaribin taybetî û reseniyên xwe yên dîrokî biparêzin.

Cudayetiya navbera şaristaniyên dinê, tenê ne rastîniyêke dîrokî; her wiha rastîniyêke bingehîn e jî.

Çimkî şaristaniyên dinê ji aliyê erdnîgarî, dîrok, ziman, ol, çand û kevneşopîyan de, her gav ji hev û din vediqetin. Lê belê cudayetiya navbera şaristaniyan bi van tiştan jî naqede, wekî din jî, ji ber bawerî, feraset û nêzîktêdayînên xwecihî jî ji hev cihê dibin.

Bo nimûne: Mirov dikare ji pêwendiya navbera Xudan û evd, kom û takekes, hemwelatî û dûgel, mêr û jin, dê û bav û zarok û hwd jî cudayetiya navbera şaristaniyan bibîne û ji hev derxîne.

Ev cudayetiya, ne cudayetiya îro ne; ta ji kûrahiya dîroka kevna nisilîne û heta vê rojê xwe parastine.

Ne pêkan e ku di demeke kin de ji holê rabin an wînda bibin û bimehin. Dê hin bi hin û hêdî hêdî bimehin.

An dê li şaristaniyêke nû dagerin an jî dê xwe bi xwe ji holê rabin.

Divê şaristaniyên kevna û nû li sentezeke erênî dagerin û her şaristanî wekî robareke jîne biherike ser deryaya aştî, azadî û mirovahiya cîhanê. Ger ku cîhan û gerdûn geşedanîyên xwe yên xwezayî bidest bixin dê kemilîn, stewîn û geşepêdaniyên gerdunî jî bibin para mirovahiyê.

Kaniya Helbestan

Xewn



Hejarê Kurd

Berî ez rakevim

Min xewn didîtin

Ku ez radiketim

Xewnê min di

Golên bê av de

Xwe hînê

Avjenî dikirin.

Min ji xwe dipirsî

Ez xewnan dibînim

An ...nizanim.

Lê dibêjim ger

Xewnê min şaş

Nebûna, minê

Zanibiya.

Lê carne bi rastî

Min xewn didîtin

Lê min newêribû

tazî bikirana.

Ji ber li Welatê me

Xewn bi zimanê

Kurdî qedexe bûn.

Rexne jî kufrî bûn,

û ez ezîyê jî cî ji

navê xwedan re

nehîştibû...

Di 21'ê Şibatê, Roja Navneteweyî Ya Zimanê Zikmakî De

Lênihêrînek Bi Ser Rewşa Zimanê Kurdî Di Îranê De

Agirî

Ziman pênaseya herî sereke a neteweyî ye. Kultûr, çand, deb û edetên neteweyekê di zimanê wî de reng vedidin. Man û pêşveçûna her gelekê di man û xurtbûna zimanê wî de ye. Di Îrana pîrnetewe de, zimanê neteweya serdest, zimanê fermî ye. Desthilatdarên şovenîst ên Îranê bona jinavbirin û tevlihevkirina nasnameya neteweyên Kurd, Belûç, Ereb, Turk, Turkemen û wd.... rêya tunekirin û aloz û têkûpêkdana zimanên van gelane girtine pêşberî xwe. Roja 21'ê Şibatê (3'ê Reşemeyê), ji aliyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve weke Roja Navneteweyî a Zimanê Zikmakî hatiye binavkirin. Ji sala 2000'an şûnde, "UNESCO"yê, ew roje pîroz kiriye, heta ku bi vî awayî pêşgîriyê ji nîva zimanên cîhanê bike ku ber bi navçûn û tunebûnê ve diçin.

Niha ji nêzik 7000 zimanên zindî ên cîhanê, nîviya wan tevî xetera jinavçûnê berbirî ne. Çawaniya serederîkirina siyasî a hikûmetan bi kêmeteweyan re, yek ji sedemên girîng yê ve tirs û xeterê ne. Hêj xwendin bi zimanê Kurdî di dibistan û navendên xwendin û perwerdehî ên Îran, Turkiye û Sûriyê de qedexe ye. Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di vê derheqê de daxwaz ji dewletan kiriye ku mafê neteweyên niştecih ên welatên xwe ji bo xwendin û perwerdehiya bi zimanê zikmakî yê wan bi fermî nas bikin û derfetê ji bo xwendin bi zimanê gelan di sîstema fêrkirina welatên xwe de pêk bînin. Di esla 15 ya Qanûna Bingehîn ya Komara Îslamî a Îranê de hatiye: "mifahwergirtin ji zimanê xwecih û fermî di çapemenî û ragihandinên giştî û xwendin bi wêjeya wan li xwendingehan, di kêleka zimanê Farsî de, azad û serbest e."

Heya niha Komara Îslamî a Îranê ev esla bi tevahî birêve nebiriye. Xwendin bi zimanê neteweyên bindest di xwendingehan de her weke berê qedexe ye. Her çiqas kêmaniyên neteweyî, kovar, rojname û pirtûkan bi zimanê xwe çap û belav dikin, lê kovar û belavok her dem di bin tîxa sansorê û gefxwarinên ragirtin û daxistinê de ne.

Ew weşanane divêt di çarçoveya siyasetên desthilatdariya şovenîstî ya Komara Îslamî de kar bikin û nabe maf û daxwaziyên siyasî û neteweyî ên gelên bindest bînin berbas. Her wiha, Komara

Îslamî di radyo û televîzyona dewletî de bi zimanê neteweyên bindest bernamayan belav dikin. Ew bernamane ji bo propagandakirina îdeolojî û siyasetên rejîmê di nava kêmaniyên netewî de tîn meşandin. Di wan bernamayan de, ziman û çanda neteweyên bindest tê tevlihevkirin heya ji vî rêyê ve zimanê wan weke zimanek jar û lawaz û zimanê Farsî bi zimanek xurt û zal bê nîşandin. Pîrrianiya kesayetiyan siyasî, çandî û wêjeyî ên neteweya Fars li ser vî baweriyê ne ku gelên bindest ên Îranê divêt ji mafê xwendin û perwerdehî bi zimanê xwe bîn bêparkirin, heta berlêgirtin ji pêşdeçûn û xurtbûna nasnameya neteweyî a kêmaniyên neteweyî bihê kirin.

Xurtbûna nasnameya neteweyî dibe sedema jordeçûna daxwaziyên neteweyên bindest û hatne rojeva daxwaziya mafê diyarîkirina çarenivîsê. Neteweya serdest vî rewşê weke xeterek bo ser yekparçeyiya welat dizane û bona berlêgirtin ji vî yekê, rêya serkut û helandina ziman û çanda gelên bindest yê girtiye pêşberî xwe. Di hember de, neteweyên bindest dabînbûna mafên neteweyî ên weke: xwendin û nivîsîn bi



zimanê zikmakî, rêvebirina kar û barên siyasî û aborî ên herêmên xwe ji aliyê wan bi xwe bi take rê û zamin û garantiya parastina yekparçeyî û pêşketina welat dizanin. Li gor Haydger, fîlosofê Almanî, "mirov di xaniyê ziman de dirame û difikire û zimanê zikmakî tenê ne zimanê pêwendigirtinê ye". Zimanê zikmakî xaniyê bîr, hizr û îdeolojî û sedemê herî sereke yê nasnameya her neteweyekê ye. Jinavbirin û tunekirina zimanê neteweyekê, ji holêrakerina çand, kultûr û hizr û ramana wî gelf ye. Bona pêşgirtin ji vî yekê û jarbûna pirrengiya zimanî û çandî, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî sala 2008'an, weke "Sala Cîhanî ya Zimanan" binav kir. Her wiha Rêxistina Neteweyên Yekbûyî hemû salekê di roja 21'ê Şibatê de, çalakiyên cur bi cur di pîrrianiya welatên cîhanê de bona rêzgirtin ji pirrengiya zimanî û çandî li dar dixê û vî roja cîhanî pîroz dike.

Li Bajarê Sine, Roja Cîhanî A Zimanê Zikmakî Hate Pîrozkirin

Navenda Nûçeyan a PDKÎ da zanîn ku roja duşem, 23.02.2009'an, bi hinceta Roja

Cîhanî a Zimanê Zikmakî, rê û resmek hêja û berfireh di bin navê "Roja Cîhanî a Zimanê Zikmakî" de, ji aliyê Rêxistinên Hevraz, Bêhbehan û Şaho, di pirtûkxaneyê giştî a bajarê Sine de bi beşdariya komek ji akinciyên taxê Ferec li bajarê Sine û hejmarek ji rêxistinên sivîl ên parêzgeha Kurdistanê hate lidarxistin.

Di rê û resma han de, serbarê

berevanî ji mafê xwendinê bi zimanê zikmakî, çanda Kurdî jî kete ber lêkolînê û di vî derheqê de beşdaran bîr û hizr bi hev re guhartin.

Her wiha di rê û resma Roja Cîhanî a Zimanê Zikmakî de, Selîm Kerîmî, Omîd Moînî, berpîrsê Rêxistina Hevraz, Filoriya Mihemedpûr û her wiha Şoreş Tehmasibî, çalakê sivîl, li ser zimanê zikmakî axivîn.

Di dawiya rê û resmê de, bi 25 kes ji xwendekarên kilasa fêrbûna Kurdî re, dawîname û destegul hatin pêşkêşkirin û her wiha rêz ji Îqbal Weysî, Wîda



Dîmenek ji beşdaran şahiya pîrozkirina Roja Cîhanî a Zimanê Zikmakî li bajarê Sine.

Ozeyrî û Şehîn Zendî, mamostayên zimanê Kurdî hate girtin.

Stêrkeke din ji esmanê me rijiya (Bêbuhar)

Besam Mistefa

Helbesta kurdî li Rojavayê Kurdistanê - nemaze ya kilasîk û bi kêş- bi çend navên sereke dihête naskirin. Her çî seyda Cegerxwîn, wek

sembola wan têtê hejmartinê, lê hin navên din jî çiyê xwe di dilê hozandostan de girtine û karibûn taybetmendiyê xwe, ava bikin; wek Tîrêj, Keleş, Namî, Nûjen, Bêbuhar û yên din. Lê belê, her demekê mirin tê û yekî ji wan ji nav me dibê; stêrkeke din ji asmanê me didize û diçe.

Yê herî dawî ku tevî karwanê nemirên hozana kurdî li Rojava bûn, mamoste Yûsivê Berazî(Bêbuhar) bû ku di roja pêncşemê 15.01.2009'an çû ser dilovaniya Xwedê û di roja îne 16.01.2009'an de di demjimêr 11:30 û bi beşdariya komên folklorî û girûp û komîtên rewşenbîrî û helbestvan û dengbêj û hunermendên ku ji kaniya peyv û awazên mamoste vexwarin û di pêşiya wan de hunermend M. Elî Şakir û Mehmûd Ezîz Şakir, şewekar û nivîskar û cewawerekî pir mezin ji hemû bajar û gundên Kurdî li Rojavayê welêt bi cendekê wî re derketin.

Yûsivê Berazî kî ye?

Yûsivê Berazî(Bêbuhar) stûnekê qahîm yê helbesta bi kêşê û lîrîkî bû, bi hest û nestên xwe yên bi keleşo kete dilê xelkê xwe de, û bû mîna kaniyê herîkî ku dengbêj û stranbêjan peyv û gotinên wî kirine stran û pêşkêşî guhdarên peyva kurdî ya zelal û awazên xemgîn û xweş kirin.

Bêbuhar bi pênûsa xwe, behsa jiyana xwe dike û dibêje*:" Ez Yûsif kurê 'Elî' Elîyê Şêxo me, berê cîwarê bav û kalên me bajarê Kobanê bû, lê piştî fermana Osmanîyan bav û kalên me çûn bakurî bajarê Helebê li gundê Tilcîrcê bi cîwar bûn. Ez di sala 1931'ê de li wî gundî ji dayîk bûm, di sala 1947'an de me jê bar kir û em li Minbicê bi cîwar bûn. Piştî heft salan, ango di sala 1954'ê de em hatin bajarê Serê Kaniyê û ta niha jî em lê dijîn. berî ku ez bibim helbestvan, dengê min gelekî xweş bû, min li tenbûrê "biziq" dixist û min bi heval û dostên xwe re di civatên gelêrî de stran digotin. Stranên me wek ku min gotî, di şevbuhêrê û civatên gelêrî de bûn. Di wê çaxê de tomarkirin tunebû.

Çîroka min bi helbestê re dût û dirêj e, berî ku ez têkevim warê stranê de, min ji helbestê hez kir, min di rêya dan û standinê re jê re kar kir. Min seydayê nemir Cegerxwîn nas kir û têtikiliyên min pê re xurt bûn, dûvre têtikiliyên min bi mamosta Reşîdê Kurd re çêbûn. Wî jî hişt ez hînî rêzimana kurdî bibim. Mele Sîrac û mele Reşîd hebûn, gelekên din jî hebûn, lê nayên bîra min. Min di rêya van camêran re gelek pirtûk xwendin, mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, pirtûkên li ser pêlawaza, yên li ser dîroka kurdî û herweha pirtûkên bi zimanê farisî jî.

Ji sala 1966-1979 ê de, çî helbesta ku min dinivîsand, min jî seydayê Cegerxwîn re dibir daku serrast bike...

-Min gelek helbest dane stranbêjan

Yê pêşî hunermend **Mehmûd Ezîz Şakir** bû. Di sala 1967'ê de min ew nas kir û min gelek helbest tevî awazan dane wî.

Mîna:

Hebs û zindan gotin û awaz Bêbuhar
Perwîn; gotin Rêncber awaz Bêbuhar
Rabe ji xewê; gotin û awaz Bêbuhar
Şînbû rîhan; gotin û awaz Bêbuhar
Eman dilo; gotin û awaz Bêbuhar
Gulîzar; gotin û awaz Bêbuhar
Dilê min her bi ahîne; gotin Bêbuhar û awaz mamosta

Mihemed Elî şakir
Şêrîn tu cînara min î; gotin Bêbuhar û
awaz M.M. Elî Şakir
Mehmûd Ezîz çû êzgeha kurdî li Bexdayê û
stran li wir tomar kirin.

Piştê **Se'îd Gabarî** derket. Hat cem min,
min helbest danê

Ew jî ev in:

Koçê mi bar kir

Hat xweş buhar

Bê bext felek

Di tarî da

Ew jî çû êzgeha kurdî li Bexdayê û stran
tomar kirin.

Min hunermend **Mihemed Şêxo** nas kir,
min gelek stran dan wî jî.

Mîna:

Hebs û zindan, Ez bûm ferar, Şêrîn tu
cînara min î, Rabe ji xewê, Yarê şakir,
Pismamo, Şeva tarî, Dayê (ez jî bi cî bim),
Dayka dilovan, Eman eman, Çibkim bi can,
Derdan çî ez dil jar kirim, Koçê mi bar kir,
Welat welat,

Gulîzar Eman dilo, Perwîn (gotin: Rêncber-
awaz:Bêbuhar), Kûba û Vêtname.

Hindek stranbêjin dî jî hene min helbest
tev awazan daye wan wek Zuber Salih,
Mistefa Xalid

Berhemên çapkiri:

1. Zindan helbest /1988
 2. Bang hebest /1997
 3. Raperîn helbest /2002
 4. Serxwebûn helbest/2006
- 5- Pêşketin- helbest-(weşanên
Semakurd 2007)"

Nimûneyek ji Helbesteka Yûsivê Berazî (Bêbuhar)

ÇEWSERÊN ZIRZ

Hey çewserên zirz û neyar
Bawer nekin hûn wî tucar
Hun Kurd dikin wenda bikin
Wenda nebê wê Kurd tucar

o o o

Kujtin ji Kurd Kurd namirê
Goh namirin Kurd namirê
Serma çiqas bê ser dehil
Dar hişk bibê reh namirê

o o o

Wê bê buhar dar şin bibê
Wê dar ji kevn xurt tir bibê
Darê çemel wê hej vedê
Wê ber ji darê pir bibê

o o o

Darê ku nûh ew çandibê
Avê ji tofan têt bibê
Ew dar emin bavê cîhan
Bawer nekin ew hişk bibê

o o o

Va dar ji Nûh şin kir xweda
Darê ji Nûh telhê xwe da
Zana ji Kurdan pir dibin
Ba ax ji ser telhan veda

o o o

Înkar Nikarê kes bikê
Rojê ku ewr wenda bikê
Wê ewr herê wenda bibê
Wê roj ji jor rohnî bikê

o o o

Rojê xweda ew çêkirî

Her can bi rojê jîn kirî
Yezdan perest pêşî emîn
Ê roj nimêj ber pêd kirî
o o o
Mîdî emîn ên ser bilind
Ferman me kir Yûnan û Hind
Kurdê neví Nûh ew emîn
Dîrok dizanê ew me rind

o o o
Em Kurd bi îslamî ketin
Gêj bûn bi ol em raketin
Hûn çewserên Kurd par kirin
Mafê mirov jê dût ketin

o o o
Îro ji xew rabûne Kurd
Kurd zanebûn bajar u gund
Partiyên ji xew Kurd rakirin
Wê Kurd bigên tiştên bilind

o o o
Derman yekîti Kurd hebê
Kurdan li nav şer çê nebê
Wê kes nikarî bin bi Kurd
Wê Kurd bi zor rizgar bibê

o o o
Herçên ji dût hatin welat
Bê zor berra nadin welat
Herçî gelê rizgar bibê
Jêra divê çeng û zebat

o o o
Wê maf tu kes bê xwîn nedê
Kurd hilnedin tim ser xwedê
Çewser eger zor lê nebê
Mafê gelê Kurd wê nedê

o o o
Her tişt bi zorê çê dibê
Xandin û zêr jêra dibê
Bê qirş tucar wê ar nebê
Agir bi qirşan gur dibê

o o o
Çewser li dij wê şer nebê
Aştî wê tucar wê çênebê
Pê xweş di zanê her mirov
Tovê nemir wê şin nebê

o o o
Şin û xweşî çerxê dunê
Dîrok bixwîn rind lê binê
Her tişt li nav şer çêdibin
Negrî mirov ew nakenê

o o o
Min jîn buhartî bêbuhar
şîret li xortê Kurd şiyar
Hun guh nedin ên kevin perest
Ava biwan nabê tu war

o o o
Çewser nedên gurzê gulan
Çewser bera wî din gullan
Çewser tucar der nakevin
Ewna bi lav lavên melan

o o o
Malê dunê tev ê we bê
Warê we ew rizgar nebê
Herçî welat berdê herê
Wê ew li wir tim kolebê

o o o
Warê we Kurdistane ew
Ê Kurd ne war Almane ew
Nabê serî ewya terî
Bê war kesê erzane ew

o o o
Çax ew ne ê bindest bijî
Bin dest kesê bê hest dijî
Rabin welat rizgar bikin
Kurd jî bi serbest bijî


o o o
Çax ew ne ê bindest bijî
Bin dest kesê bê hest dijî
Rabin welat rizgar bikin
Kurd jî bi serbest bijî

o o o
Çax ew ne ê bindest bijî
Bin dest kesê bê hest dijî
Rabin welat rizgar bikin
Kurd jî bi serbest bijî

o o o
Çax ew ne ê bindest bijî
Bin dest kesê bê hest dijî
Rabin welat rizgar bikin
Kurd jî bi serbest bijî

Axavtina Bi Kurdî Ya Ahmed Turk Hate Birrîn

► Axavtina bi Kurdî ya Ahmed Turk Serokê DTP'ê, di civîna koma wê partiyê de li Parlemanê, nîqaşeke germ û gurr ya din xiste rojeva siyasî a Turkiyê. Di dema ku



axavtina Ehmed Turk bi zindî ji TRT3 dihat weşandin, bêjera televîzyonê weşana zindî rawestand.

Benda 81'mîn a qanûna partiyên siyasî ji bilî zimanê Turkî, bikaranîna zimanekî din qedexe kiriye. Li gora vê qanûnê, divêt di Parleman û civînên giştî de tenê bi Turkî bê axavtin. Eva nîşaneyeke eşkere ya paradoksekê di kiryar û yasayên dewletê de ye. Ji aliyekê televîzyona bi Kurdî tê danîn, ji aliyê din yasayên Turkiyê hêj axavtina bi zimanên din qedexe dikin.

Birrîna weşana televîzyonê li ser axavtina Ehmed Turk û ev sansor eşkere ya dewletê, bala medyayên bi nav û deng ên cihanê rakîşand û bi tundî dewleta Turkiyê rexne kirin.

Koma Kamkaran Bajarê Vankoverê Bi Muzîka Kurdî Xemilandin



► **Hejar Birincî/ Kanada:** Roja yekşem, 22'ê Şibata 2009'an, di hola navendî a bajarê Vankover li Kanadayê de, konserek mezin ji bo koma muzîka Kamkaran hate lidarxistin. Nêzîk 700 kes beşdarî konserê bûn ku beşek zaf Kurd bûn.

Konser di du beşên Farsî û Kurdî de çê bû. Di beşa yekem a konserê de, koma Kamkaran çend perçe stranên bi zimanê Farsî pêşkêş kirin û bala beşdaran bo aliyê xwe rakîşandin. Piştî koma muzîkvan û hunermendên Kamkar bi reng û bêhnêk tewaw kurdewarî derketin pêşberî beşdaran û çoxek germ û bêhmînak dan konserê û beşdar û hunerhezên muzîka Kurdî matmayî kirin û bi hunera xwe Vankovera Kanadayê xemilandin. Pêşwazî û beşdariya germ û berfireh ya Kurdan ji koma Kamkaran ew kêfxweş kirin.

Li Îranê Meytê Kuştîyên Şer Di Zanîngehan De Tê Veşartin!



► Di kiryareke din ya ecêb de, rejîma Komara Îslamî a Îranê, projeyek nû ji bo veşartina termên kuştîyên şerê Îran û Îraqê dest pê kiriye. Di çend zanîngên Tehranê de, projeya han ya ecêb hatiye meşandin û bi vî awayî zanîngehan dikin goristan. Xwendekar ji ber vê karê dewletê bi xurtî nerazî ne. Di encama nerazîbûna roja 23'ê Şibata 2009'an a xwendekarên zanîngeha "amir kabir" a Tehranê de, pevçûnek tund di navbera xwendekarên nerazî û hêzên Besic û Pasdaran de derket holê û nêzîk 60 xwendekar birîndar bûn û 70 xwendekar jî hatin girtin.

Ji bilî danîna binkeya hêzên Besic ên ser bi Sipaha Pasdaran û her wiha hêzên ewlekariyê di zanîngên Îranê de, niha meytên kuştîyên şer jî di zanîngê, cihê zanist û fêrbûnê tê veşartin û zanîngehan dikin goristan.

Hate ragihandin, li bajarên Kurdistanê jî qirar e ku di organ û dezgehên dewletî de ew proje bê destpêkirin.

Biryara Îdamkirina Hebûbula Letîfî Hate Pejirandin

► Rêxistina Çavdêr ya Mafê Mirovan li Kurdistanê, roja 17.02.2009'an, biryara îdamkirina Hebûbula Letîfî, çalakê xwendekarî û xelkê bajarê Sine, ji aliyê Taya 4 a Dadgeha Pêdeçûnê a parêzgeha Kurdistanê ve hate pejirandin. Hebûbula Letîfî di payîza sala borî de li bajarê Sine hate girtin.



Navhatî piştî 8 mehan binçavbûnê, di berrava 10'ê Pûşpera îsal de, ji aliyê Dadgeha Şoreş a Sine ve bi îdamê hate mehkûmkirin. Hebûbula Letîfî ku nûçeya daliqandina wî hatiye belavkirin û ji aliyê malbata wî jî hatiye piştrastkirin, di destbisergêha Îdareya Ewlekarî a Sine de hatiye îşkencekirin. Navhatî bi buxtana "Muharibe"(şer tevî Xwedê) bi rêya endametiya yek ji partiyên Kurdistanê ên neyarê rejîma Îslamî a Îranê hatiye tawanbarkirin.